

"Em naxwazin çarenivîsa lêvegera nû wek çarenivîsa Desteya Bilinda Kurd be"

Kurdistan Cemal Umer



Encûmena Niştîman ya Kurdî li Sûriyê ENKS û Partiyên Yekîtiya Niştîmanî ya Kurd PYNK danûstandinên wan berdewam dikin, û tê gotin ew li ser Lêvegera

Bilinda Kurdî lihev kirine. Lêvegera Kurdî a Billind ku pêştir jê re dihat gotin Lêvegera Siyasî; ji sedî 40 ENKSê, ji sedî 40 PYNK û ji sedî 20 jî ji partiyên derveyî herdu aliyên derbasî Lêvegerî


bibin, ku ji wê rêjeyê aliyên derve ji sedî 10 ji aliyê ENKSê û ji sedî 10 jî ji aliyê Partiyên Yekîtiya Niştîmanî ve bêne destnîşankirin. Welatî bi vê pêngavê dilxweş in, lê naxwazin

mîna rêkeftinên berê bê sûd biçin. Saman Mehmûd wiha li ser vê mijarê dibêje, pêşketinên danûstandinan cihê kêfxweşiyê ne, û ev yek jî daxwaza hemû xelkê Kurdistan Sûriyê ye,

lê em naxwazin wek rêkeftinên berê têk biçin, û dive bi cidî kar li ser vê mijarê ji herdu aliyên were kirin û astengî nemînin. Cuma Hemê jî wiha dibêje, em naxwazin çarenivîsa lêvegera

nû wek çarenivîsa Desteya Bilinda Kurd be, ku ti kar birêve nebiri û ji aliyê PYDê ve wê demê hate astengkirin, divê destê derve bêne qutkirin bi taybet di vê prosê de.

Rewş li Kurdistana Sûrî berek ku ve diçe



Mahir Hesên

Rewşa Kurdistana Sûrî ber bi ku ve diçe, nemaze di bin giraniya nakokiya heyî de, û alozbûna siyasî û pirsgirêk û qeyrana aborî . Heman demê de gavên sist di dîtina çareseriyek siyasî ji bo sînor kirina mercên trajîk re têne avêtin . Her wiha Opozisyona Sûrî dest bi hêncet

û behanayên derwîn kirine . Armanca Hewldana wê jî ew e ji bo pûçkirina danûstandinên di navbera her du aliyên Kurdî de ye . Opozisyon çiqasî bi kurdan de vereşehe , ewqs dibe peymanek di gelek astan de bi kêrî Serokê Dewleta Tirka barbar tê, ji ber

ku ev stratejiyek wî bi lez û bez mezin dike. Wek cebilxaneyek jê re dibe hêz , û di hilbijartinê bê de, da ku piştgiriyê bide. Pêşbazî û desthilatdarî bûye armanca pêxwasên Opozisyonê . Bi geşedanên heyî re, diyar dike ku pirsgirêk êdî tenê li ser herêma Kurdistana Sûrîye , û her wêdetir diçe , xirabtir dibe , ji ber ku bi nijadperestiyê re rû bi rû bû. Artêşa Opozisyona sûrî ji mîlîsên îdeolojîk ve girêdayî Tirkîye tê bi kar kirin. Dive ji hestê berpîrsiyariyê, û parastina destketeveanînen xwestek û daxwazên Kurdan li Kurdistana Sûrî , bi Gavên paqij ber pêşve çûna domdar , û li ser bingeha ezmûna tekoşîna dirêj di ava

kirin û damezrandina herêmê kurdistana sûrî , û ji bo yekkirina destkeftan, nirxandina xwîna şehîdan û dabînkirina paşerojek geş a Kurdistanê, û vegeandina mafên ên destûrî û him navçeyên mîna Efrîn û xurtkirina têkiliyan bi dewlet û diniyayê re , ji her du aliyên Siyasî li Kurdistana Sûrî tê xwestin ku lihevhatina siyasî ne bi yek alî ve were girêdan wek Peymanên perê .

Çawa em dikarin kef û zirtên Ereb , û Tirkan pûç û biherivînin ?! Her yek ji dehma xwe ve beşdarî avakirin , rêvebirin û xurtkirina saziyan , yasayî û rêveberî yên herêma Kurdistanê sûrî bibin, da ku di çarçova rewabûnê de bin, û

pêkanîna wan divê hêza ji bo vîna gel . Paşî ew sazûmana ya siyasî û îdarî bi xurtî û degelî werw parêztin, û ji bo bihêzkirina wê bixebitin. partiyên Kurdan , bi hemî enerjîya xwe, reformanek kurdî pêk bînin , zelalîyeka zêdetir pêk bîne, şerê dijî gendeliyê bike û rola saziyên çavdêriyê li Kurdistana Sûrî xurt bike.

Heger wisa berjewndiyên Miletê xwe parastin , êdî dibe ku di asta hikûmeta Sûrî de, bingeha pergala mafên destûrî ava dikin û bi yek nerîne nûnertiya me di saziyên dewleta Sûrî de bikin , heya ku karibin bi damezrandina Hevbendîya Kurdî bi armancek hevpar bi serbikevin .



Roj bi roj korona li Kurdistana Sûriyê zêde dibe

Kurdistan-
Ehmed Emîn

Roj bi roj korona li Kurdistana Sûriyê zêde dibe, hejmara pêketiyên rasteqîne jî gelekî ji yên têne

belavkirin zêdetir, lewma daxwaza pabendbûna bi rênmayên tenduridîti têne kirin. Welatî jî daxwaza tûndkirina rênmayan dikin, herwiha dixwazin

sîstemên tenduristiyê bêne baş kirin. Mehmûd Beşîr wiha li ser vê mijarê dibêje, bi rastî rewşa li Kurdistana Sûriyê ji aliyê vayrosa koronave gelekî zehmet e,

û pêwîste di aliyên peywendîdar bi hewara xelkê ve biçin, û sîstema tenduristiyê bihêz bikin da ku rewşa ji ya niha xerabtir nebe, niha roj bi roj rewşa deverê xerab dibe û hejmara pêketî û mirinê zêde dibe, û ti alî jî rêgirî li vê yekê nekiriye, ev yek jî vedgere sîstema xerab ya tenduristiyê. Cîhan Ebdula jî wiha li ser pirsê vayrosê korona li Kurdistan Sûriyê dibêje, em niha di werzê payîzê de ne, û dê rewşa di meha bê de gelekî ji rewşa niha

xerabtir bibe, û dive aliyên peywendîdar xwe ji vê pêla korona re amade bikin, û hemû karînen xwe bixin jêr başkirina rewşa tenduristiyê, ev mehên bê wê gelekî zehmet be li ser karmend û kerta tenduristiyê, lewma divê rêkarên xwe zêde bikin û xwe bêhtir ji vê yekê re amade bikin. Dîlan Xidir jî wiha li ser vê mijarê ji rojnameya Kurdistan re dibêje, ya herî giring di vê demê de aliyên peywendîdar sîstema xwe ya tenduristiyê bihêz bikin, xwe ji qonaxên xerabtir re amade bikin, dive bi rsatî kombûn û dawet û şînî werin qedexekirin, heger na dê rewşa berev xerabiyê ve biçê, hişyarî têne dan ku di mehên bê de vayrosa korona dê belavtir bibe, wê demê dê kontrola li ser wê jî gelekî zehmet be, lewma di vê control jî dest neçe, û em hişyar

bib. Xelk jî dive pabendî rênmayên tenduristiyê be û dûrî qerebalizyê bikeve, xwe ji serdanên bê sûd dûr bikin, maskan bikar bînin, û haydar bin û nebêjin ku korona nine, korona vayrosêkî hebûna wî li ser erdê heye, û li derdora cîhanê jî heya niha zêdetirî ,ilyonek kê pê miriyê û derdora 24 milyon kes jî pêketiye. Heta ku vaksîn jê re neyê dîtî de rewşa bi vî rengê be û nabe tedbîr bêne sisitkirin, û dive rênma berdeham bêne belav kirin û xelk xwe ji rênmayan nervînî, divê li dibistanan rênmayên tenduristiyê werin cibicîkirin, û hemû xwendekar pabend bin û ewên pabend nebin dive werin sizadan, heger bi vî awayî biçê dê rewşa xerab bibe, lewma xweparêzî baştirîn çareserç ye.



Referandoma serxwebûnê

nîşan da Kurd miletekî zindî ne

Kurdistan

Giştirsîya serxwebûna Başûrê Kurdistanê, kar û xebatên di rêya serxwebûna Kurdistanê de ye. Piştî sala 2003an ku DYA kete nav axa Îraqê de derfetek mezin ji bo kurdên başûr çêbû ku statuyekê bi dest bixin. Jixwe statuyek ji standin û piştî wê ji kar û xebat di rêya serxwebûnê de dikin. Li sala 2004ê li welat û derveyî welat destnîşan kom kiribûn ku kurd dixwazin serbixwe bibin. Di encamê de 1 milyon 700 hezar destnîşan hatin kom kirin û teslîmî Neteweyen Yekbûyî kirin. Her wisa di rêbendana 2005ê de ji referandûmeke nefermî hate kirin ku pirraniya kurdan serxwebûn dixwast. Niha gehîştîye asta giştirsîya serxwebûnê. 30ê adara 2017an, serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanî li Hewlêrê pêşwaziya sekreterê giştî yê rêxistina Neteweyên Yekgirtî António Guterres kir. Di vê civînê de Mesud Barzanî ji di gel sekreterê giştî yê rêxistina Neteweyên Yekgirtî re gotiye ku di demeke nêz de wê referandûma serxwebûnê were kirin û ji Neteweyên Yekbûyî xwestiye ku alikariya wan bikin. Di 2ê nîsana 2017an de Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) û Yekitiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) li ser referandoma serxwebûnê û bilindkirina alaya Kurdistanê li Kerkûkê civiyan. Li gor siyasatmedarên kurd



ev pengava yekê bû ku li ser giştirsîyê her du alî kom bûn. Nûnerê taybet yê Neteweyên Yekbûyî yê Îraqê di 22ê gulana 2017an de got ku Herêma Kurdistanê di derbarê referandûmê de em agahdar kirine û her wisa lêzêdekir ku gelê Kerkûkê dixwaze bikeve nava Herêma Kurdistanê. Her wisa Mesud Barzanî di 25ê gulana 2017an de çû Sofiyaya paytexta Bulgaristanê. Li vir li gel serokwezîrê Bulgaristanê Boyko Borissov hevdîtinek pêkanî û ji wi re behsa referandûmê serxwebûnê kir. Li gor serokê komiteya hîlbijartin û giştirsîyê Hendren Muhammed Neteweyên Yekbûyî wê di giştirsîyê de bêalî bibin û ji bo ku giştirsîyê yasayî bibore wê ofisan vekin. 14ê îlona 2017ê li Duhokê di navbera Serokatiya Herêma Kurdistanê û Neteweyen Yekgirtî

re bi beşdabûna DYA, Almanya, Fransa û Brîtanyayê de hevdîtinek girîng hate kirin. Serokê Herêma Kurdistanê bi aliyên siyasî, partiyên û hinek bûrokraten re 7ê pûşpera 2017an de li Pîrmamê kombûnek pêk anî. Di wê kombûnê de biryara referandûma serxwebûna Kurdistanê hate îlankirin ku referandûm di 25ê îlona 2017an de were kirin. . Parlamentoya Kurdistanê ji 15ê îlona 2017ê de ev biryar pesend kir. Di vê civînê de amadebûyên civînê bi koma dengên li ser van çend xalan li hev kirin:

- Yekem: Roja 25ê Îlona 2017ê weke roja sazkirina referandûmê li Herêma Kurdistanê li Herêma Kurdistanê yê derveyî rêveberiya herêmê hat diyarkirin.
- Duyem: Her ji roja dawîhatina civînê

heta dema birêveçûna referandûmê, hemû alî xebatê ji bo ji bo çalakkirina parlamentoyê û çareserkirina pirsgerêkên siyasî bikin, ew yek ji bi armanca bi dest xistina komdengiya niştîmanî.

- Sêyem: Tekezî li ser başkirina debar û rewşa jiyana xelkê û awirdan li arîşeyên aborî yê hevwelatîyên Kurdistanê û mûçewergir û çîn û tijwêj û xelkê kêmdahat hat kirin.
- Çarem: Biryar hat dayîn ji bo pêkanîna Encumena Bilind a Referandûmê bi serokatiya birêz Mesud Barzanî. Herwiha biryar hat dayîn, ku heta roja 12ê îlona 2017an partiyên siyasî nûnerên xwe bo beşdarbûn di çend komîteyên taybet bi referandûm û piştî referandûmê de diyar bikin.

sê sal di ser lidarxistina referanduma serxwebûna

Kurdistanê re derbas dibe û Serok Mesud Barzanî bi vê helkeftê peyameke kurd da û ragihand: "Em xwe natewînin." sê sal di ser lidarxistina referanduma serxwebûna Herêma Kurdistanê re derbas dibin, ku bo yekemîn car di dîrokê de gelê Kurd li parçeyê Kurdistanê bi awayekê azad û di referandûmekê de biryar li ser çarenivîsa xwe da. Serok Barzanî bi vê helkeftê di peyamekê de li ser Twitterê ragihand: "Em xwe naçemînin." Di 25ê Îlona 2017an de, referanduma serxwebûnê li tevahiya navçeyên Başûrê Kurdistanê, tevî Kerkûk, Xaneqîn, Xurmatû, Şingal û Deştê Neynewayê hat encamdan û li gor encamên fermî nêzîkî %93 xelkê Başûrê Kurdistanê bi Erê deng bi serxwebûnê dan. Ji 5ê Îlonê ve heta roja lidarxistina

referanduma serxwebûnê, bo dema 20 rojan tevahiya bajar û bajarokên Başûrê Kurdistanê bi alên Kurdistanê hatin xemildandin û karnavala serxwebûnê bajar bi bajar digeriya. Serok Barzanî di dema kempîna referandûmê de bajar bi bajarê Kurdistanê digeriya û ji xelkê Kurdistanê re zelal dikir, ku çima biryara lidarxistina referandûmê hatiye dan û behsa sedemên xwasteka xelkê Kurdistanê bo cudabûna ji Îraqê dikir. Umer Hebeş wiha dibêje, Referandom pêwîstîyeke girîng bû, û lidarxistina vê prosêse ji berjewedniya gelê Kurd re, rast e rastî dorpeçê hat, lê dengê zêde li tevahiya cihanê û navçeyê veda û ev yek tekez kirk u Kurd gelekî zindî ne û dev ji nasname û netewa xwe bernedane.

Karê Koma Govenda Kurdî ya Jinan li Elmanya di rêya kurtefilmekî de hate nîşandan

Kurdistan-
Elmanya

Kurtefilmek derbarê xebata Koma Govenda Kurdî ya Jinan li Elmanya bi navê "Çivîka Penaber" hate pêşkêş kirin.

herwiha ev kurtefilm ji berhemên Koma Govenda Kurdî ya jinan e.

Koma Govenda Kurdî ya Jinan li bajarê Şilêsvîga Elmanya bi serpereştîya Şilan Doskî sala 2019an hatiye damezirandin.

Kurtefilm ji 11 xulekan pêk tê, li ser kurteçiroka penabereke Kurd ku li dewletên Kurdistanê dagîr dikin nikarîbû bi azadî derbirîna hestên xwe bi Zimanê Kurdî bike. Beşê duyem ji filmê Çivîka Penaber li ser destpêka damezirandina koma folklorê Kurdî ya jinan e. Koma Govenda Kurdî, ev Kom bi fermî ya fermanberiya koçber û Penaberan e ya herêma Şilêsvîg- Filênisbûrg e (Schleswig-flensburg). Şilan Doskî ku damezrênera vê komê ye wiha dibêje: Çivîka Penaber, filma Koma Govenda Kurdî ye û ev kom ya fermanberiya koçber û Penaberan e, ya herêma Şilêsvîg- Filênisbûrg e (Schleswig-flensburg). Ev kom di buhara sala 2019an de hate damezirandin, di film de jinên Kurd xewnên xwe yên mirî zindî dikin, û hêviyên nû tînin ziman. Armanca sereke ew e nasandina nasnameya Kurdistanî ye bi ziman û çanda Kurdî. Rahênerên Koma Govenda Kurdî jî her yek ji, Sozan Abdalkarim ji Silêmaniyê, Mihemed Ehmed ji Efrînê Exlas Ezîz ji pêkhatiya kirstyan û ji Zaxo ye. Ji bo vê xebatê nêzik salekê rahênan û perwerdeya dîlanên Kurdî bi endamên Koma Govendê hatiye kirin, berî roja pêşkêşkirinê ku ahengeke mezin jê re hatibû amade kirin, lê mixabîn ji sedemên vîrûsa Covîd 19 hate rawestandî û heta niha jî pêşkêşkirin nehatiye pejrîrandin, tenê ev film hate erêkirin ku pêşkêş bibe bi mercê ku ne bêtir ji pêncî kesan li hindirê salonê amade bin. Şevbuhêr pêkhat:

Bi amadebûna Serokê Herêma Schleswig-Flensburgê

Dr. Wolfgang Bûşman -(Landrat: Dr.Wolfgang Buschmann) û serokê fermanberiya Koçber û Penaberan Reyner Şitîmkê (Rainer Stimcke) û bi amadebûna Serokê Partiya kêmnetewan ya Danîmarkî li Elmanya SSW Filêming Mayer (Flemming Meyer). Di pirogramê de Peyvek li ser nasandina Filmê Çivîka Penaber û koma govenda kurdî berî film bête nîşandan Şilan Doskî pêşkêş kir. Berpirsa Hevrêzkara perwerdeya penaberan li Herême Xatûn Silkê Vîlîg (Sylkê Willig) jî li ser nasandin û çanda miletan axivî. Organîzekirina Programê şevbuhêrkê û wergerandina zindî û ya hevpeyvînan jî hêla Amed Doskî ve hatiye organîzekirin. Derhênerî û montaja Film jî hêla herdu biraderên Îranî birêz Ferşad û Ferhad Golzade ve hatiye amadekirin.

Berpirsa Hevrêzkara perwerdeya penaberan li Herême Xatûn Silkê Vîlîg li ser vê çalakiyê wiha got: Mafê mêr û jinan wek hev e. Ez wek yekemîn jin, ku li vê herême Rêveberiya karûbarên koçber û penaberan dikim. Di dîrokê de ne herdem mafê jinan wek yê mêran parastî bû, me xebateke pir dijwar bo demokrasiyê kiriye, û gerek vê demokrasî û wekhevîyê biparêzin gerek em wekî erkeki di jiyana rojane de bibînin, ew bo her kesekî erkeki giring e.

Ji aliyê xwe ve, Serokê Partiya kêmnetewan ya Danîmarkî li Elmanya FSSW ilêming Mayer wiha dibêje: Wek kesayetiyeke ji kêmnetewekê piçûk ez giringiya kiltûr û çandê di parastina nasnameya her miletekî de dizanim. Bê zimanê kurdî wê çanda kurdî tune be, her wisa wê nasnameya kurdî jî tune be. Ji ber vê yekê gerek hûn giringiyê bi Zimanê Kurdî bidin. Zimanê Kurdî nasnameya we ye, kiltûra we ye ji ber vê yekê parastina zimanê xwe bikin.

Li vê fermanberiyê jibîlî koma Govenda Kurdî wek parastina kiltûran, koma Ermenî û ya Evxanî jî hatiye damezirandin, û berdewam çalakiyên cor bi cor lidardixin.



25 Eylûl

Emel Hesên



Rojek şahî û Şanaz e
Saz û deng û awaz e
Bilbil ji kêfa dil Şad e
Li min û yarê çivat e
Reqis û Sema Xebat e
Li ser qada Welat e
Guvend û xweş dîlan e
Çar perçê Kurdistan e
Xemilîn bi Ala Ciwan e
Serxwebûna Kurdistan e
biryar ji mala Barzan e
Çepera Serhildan e
Azadiya gulperîn e
Şêrîna gulvejîne Xweşiya
gula jîn e
Evîna mem û Zîn e
Li warê Raperîn e
Şoreş û Tekoşîn e
Tîrêja Rojhelat e
Bakûr û Başûrê welat e
Mezgîn a xweş Xelat e
Rojava û Rojhelat e
Zinar û deşit û lat e
Kurdistan ye welat e
Ji rêbaz Barzan î
Îro Serok biryar danî
Serkeftinek xweş anî
25 Eylûl nîşana Cîhan î
Kete dîroka Arî Bi Çaksazî û
dilovanî
Keremke were li banî
Ey Şah û mirê Barzan î
Serok û Serkêşê Netewî
Pêşmergeyê qehreman î
Referandûma te danî
Naçe ji bala yek can î